

Vayrûsa Korona SARS-CoV-2 ya nû

Agahdarî derbarê SARS-CoV-2

Ji destpêka kanûna yekem ji sala 2019 ve li destpêkê li Wuhan, ku dibe paytexta Herêma Hubei ya ku dikeve nîvê Welatê Sînê, roj bi roj bêhtir mirov bi nexweşiyên endamên bîhnê dikevin, ku ev vayrûsa Korona (SARS-CoV-2) ya nû sebaba wê yekê, ku behra bihtir li Welatê Sînê berbelav e.

Ev nexweşî behra bihtir di rêya xwêzî û belxemên endamên bîhna mirovan ji mirovan vedikeve mirovan.

Piştî heta bi 14 rojan ji pêketinê yan hembêzkerinê ev diyarde li ba nexweşan peyda dibin:

Germ, Kuxik, Bîhtengî

Piştî ku hun ji seferekê ji wan Herêmên, ku haletên pêketina bi COVID-19 lê peyda bûne, vejeriyan

Heger di navbera 14 rojan piştî vegera we germ, kuxik yan bîhtengbûn li ba we peyda bû:

- Heta hun karibin danûstandinên, ku ne pêwîst bin, nekin,
- Heta ku derfeta we hebe li mala xe bimînin,
- Heger hun kuxîn yan pişkîn, xwe ji mirovên din dûr bikin û piştî xwe bidin wan; heger hun pişkîn zenda xwe bidin ber dev û bêvila xwe yan destmalekê bi kar bînin, û piştî hingî wê destmalê yekser bavêjin (Rêbazên kuxînê û pişikkirinê),
- Herdem destên xwe baş bi avê û sabûnê bişon û destên xwe navêjin çav û bêvil û devê xwe (Paqijiya destan),
- Pêşî telefûna textorekî bikin û jê re bêjin, ku hun ji seferekê tên.

Heger hun ji Herêmekê hatin, ku ji aliyê Înstîtûta Robert Koch ve wek Herêma xeternak hatibe destnîşankirin (Nexasim lê vê herêmê gelek mirov pêketine)

Heger hun di van her 14 rojên dawî de li Herêmeke xeternak bûn, bêy ku diyarde jî li ba we peyda bibin

- Heta hun karibin danûstandinên ne pêwîst bin, nekin,
- Heta ku derfeta we hebe li mala xe bimînin,

Li dema peydabûna diyardeyên dijwar yê bîhnê, çi sivik çi giran, heger germa laş hebe yan nebe

- Li gorî wan rêbazên li jor hatîn behs kirin, bi rê ve herin ji bo paqijiya destan û rêbazên kuxînê û pişikirinê
- Pêşî telefûna textorekî bikin û jê re bêjin, ku hun ji seferekê tên.

Heger hun dîsa seferê bikin

- Hay ji agahdariyên wezareta karûbarên derve hebin.